Berhemî: Sware Îlxanîzade (1937-1976)
Le kitêbî: Xewe berdîne

Şar

Gulim!
Dilim pire le derd û kul
Elêm birom le şareket

Elêm be camê awî kanyawî dêyekem
Îlacî kem kulî dilî pirim,
Le derdî întîzareket
Werez bû giyanî min le şar û hareharî ew
Le rojî çilkin û nexoş û taw û yawî şew

Elêm birom le şareket
Le şarî çaw leber çiray nîyon şewareket
Birome dê ke mangeşew bizête naw bizem
Çilon bijîm le şareket
Ke pirbedil dijî gizem?!

Le şareket, ke remzî asin û minareye
Melî ewîn xewareye
Elêy le dewrî dest û pêm
Ewey ke têl û tan û rayele, kelepiçeye
Ewey ke peykere mîsalî dawele

Ewey ke daretêle, mezherî qenareye
Le şareket ke mendî dûkele
Ke dête der le malî dewlemend
We tîşkî bê gunahî xoretaw exate bend
Le her şeqam û kûçeyek şeporî şîne

Dê berew dilim
Destî gerimî aşina nîye ke eyguşim
Destî çêwîye
Le şareket zelîle şêr,
Bawî rêwîye

Be her nîgayek û petayeke
Elêm birom le şareket
Gulim, herêmî zong û zel
Çilon ebête caregul
Le şarî to, le banî ereşe qonerey diraw

Şareket
Aske cwanekem!
Teske bo ewîn û bo xefet heraw
Kê le şarî to, le şarî qatlî hejar
Gwê edate ayetî perawî dil?

Minê ke goçî tawî gerimî ber dewarekey eşîretim
Be dareterimî kûçekanî şareket
Ranehatûwe leşim
Binarî pir beharî dê
Rengî sûr û şîn eda

Le şî`r û atîfey geşim
Elêm birom le şareket, gulim

1970

Serçawe: saytî Vejîn

Https://books.vejin.net/ck/search?c=%D8%AC%DB%86%D8%B4%DB%8E%DA%A9%DB%8C&a=17&l=1